# PEYVA TAZÎ

Dildar ismail

Hebû nebû ji peyva tazî a 2 an çibû …

Weke hûn dizanin çivîna dîna bi dawî bû ,çawa qebqeba devê wan ,tê guhê zarokan û goştê sor dicûn,bi wan nîv diranên mayîn . an ew taximê ji hev ketî.ku hêjî li ber xwe didin,bi der ketina wan ji civînê , zaroka êrîş berdan hundirê civînê , da ku xwe bighênin legenên mištî goşt û moşt , lê mixabin û sed carî mixabin …? Zarokên delal , neghiştin tiştekî , ji bilî legenên vala ku şûştin jî ……ji wan re nabe , zarok dinêrin, çawa her dînek bi der ketina xwere , rahiştiye hestiyek ,tev goşt û moşt. Çawa diramîsin bi wan lêvên li ser wan diranên ji hev ketî , didin ber geza . zarokên hêja bi paşve xwe kişandin û kesera dikşênin û bi melûlî berê xwe ne dan wan dîna û dane rê û her yek çû mala xwe . lê ev buhirî , emê vegerin civînê çawa bihurî bi çi rengî , hatibû ser hev . weke hûn dizanin ku ev cara yekemîne. ku ev dîn li hev dicivin, bi rihekî eşq û şad û hevaltiyeke goştanî …û bi alîkariya mirovne dest dirêj û dest giran,lê ev jî li alîkî û li aliyê din çawa ev civîn hate ser hev pêkhat û her dînek ji alîkî, hûn dizanin çima, hûn dikarin bêjin…

Ev cara yekemîne ku li hev dikin û xwedê wan bihêle , ji wan hestiyare . û avakirina koska mirîşka bi dawî kirin ku heya mirinê wê şiyarbin û di ciyê xwede wê bimînin li ber rojê ku roj neyê der da ku em di tariyê de bijîn .

Windabibe her tişt û goştê hestiya levadikin , bawer bikin jîrin , çawa gelek sal di dînbûnê de buhirandine. Kes wek wan xwedê nedaye . ku ne boşê mezin û ne boşê piçûk wilqa karîbûn li ber xwe bidin .lê ev dînê me pir jîrin û mêjiyê wan qadê diqelêşe. Xwedê wan bihêle ji hestiyên goştê berxên nêr piştî mirşkên belengaz bi çolan xistin. Da ku bikeve mêjiyê şêr . lê li hev kirin û daxwiyaniyek ber fereh dan çapkirin û li ser malperên Afrîqa hatin belavkirin bi zimanekî nûjen da ku yek têde neghêje .